DERGÛŞ

Berken Bereh

DERGÛŞ

Çi bêjim bê feyde ye
hatin û çûna min bi hev ra
ji xwe
hê nav jî li min nehatibû kirin.

DAYIK

Va bêbavan
pirtukên pîroz jî nexwendine
ji evînê bêpar in
berxê min di dergûşê de ma
destên min bûn dareke hişk
û me hev hembêz nekir.

ZAROK

Min digot qey
ev jî lîstokek e
hey hawar dikim
kes nayê banga min
goga bavê min îroj kirî jî
ma di hewşê de
wê kî pê bilîze gelo
kes ma?

MAMOSTA

Çiqas li min xweş dihat
evînê hînê zarokan bikim
hevaltî, biratiyê
hê zengila betlanê lê nexistibû
ev mirin çima
û li depreşê nîvco ma
nivîsa serfiraziyê.

AXA

Ev çend mal û milk
ev çend dirav û zêr
û bêdadiya min
nekarî rawestîne mirinê
min digot wê em ne tê de bin
çima em haydan nedan?

XORT

Min gustîlkek kirîbû
ji bo gulbihara xwe
va em bi hev re çûn
wê bidin yeke din
min ji bo wê hewce nema.

HELBESTVAN

Kê digot
wê evqas bi wate be helbesta me
ku tu car pênûsa min
xwîn nerijand.